



Evîn ZÎLAN

**P**êvajoya 5' mîn a hilbijartina parlamentoya herêma Kurdistanê di pêvajoyeke pîrr aloz û ne guncaw de derbas bû. Ev hilbijartin jî di rewşekê de çêbû ku Rojhelata Navîn di nav qeyranekî cidî a leşkerî, civakî û siyasî deye. Ev rewşa bi qeyran li Kurdistanê hîn zêdetir xwe dide diyar kirin; ji ber ku Kurdistan navenda vî şer û aloziyê ye.

Bi encam bûn an jî nebûna hilbijartinên li herêma Kurdistanê ji bo gelek aliyan girîng bû û di heman demê de ji bo Kurdan jî xwedî girîngiyek cûda bû. Di encama vê yekê de, wisa lê hatibû ku her alî di çerçoveya berjewendiyên xwe de hewl didin bibe nav hevpeymanê de, ji ber vê çendê jî lez û bezêke dîplomatîk mevzû behs e. Bê guman destlêwerdana dewletên derve, hem di asta welatên herêmî de, hem jî hêzên hegemon yên cihanî ji bo diyar kirina encama hilbijartinê; encamek ligor ew dixwazin, di nav hewldanan de bûn.

**Hêza xwe ji gel digirin**

Hilbijartin û parlamento mijareke ku ji bo pêkanîna demokrasiya gel pêş dikeve, lê belê ji bo pêk nehatina vê yekê çî ji destê wan hat kirin. A rast ev pêvajoyê, pêvajoya destwerdana hêzên desthilatdar û hêzên kevneperest yên Kurd bû ku li pey ka kîjan alî dikare hîn zêdetir bi hêz be û di hilbijartinan de serbikeve bû. Li pey ka kê dikare bibe xwedî hemû herêma Kurdistanê ku hîn zêdetir axa welat pêşkêşî dewleta Tirk a faşîst bike. Ji xwe encama vê yekê jî Kurdistanek di bin dagirkeriya Tirk de û bilindbûna kesek xwedî feraseta Erdogan bû. Lewma Îran, Emerîqa û bi taybetî jî Tirkiyê hemû hêz û hewldana xwe a ji bo beşdar nebûna hêzên demokratîkxwaz a gel di şexsê Teverga Azadî a gelê Kurdistanê de da nişandayîn. Ji ber ku tenê Teverga Azadiyê bû ku bi vîna azad tevdiqerî. Derveyê gel piştî xwe neda tu hêzeke derve. Ji xwe, hêza xwe ji gel digire û wisa xwe birêxistin dike.

Di heman demê de, di Teverga Azadî de beşdar bûna jinan bi şeweyek herê rast pêk dihat û tenê ji bo sembola xweşik-

# Hilbijartin û encamên wê

hiyê jin beşdarî qada siyasê nedibûn, ew bi hêz û cisareta jinê beşdarî hilbijartinê dibûn. Vê yekê jî çavê zilam ku xwedî hişmendiyek baviksalar e, tirsand.

**Ew ji hêza jinê ditirsin**

Mixabin bê siyaseta tevgerîna berpirsên hikûmeta herêmê wisa kiriye ku jin di demê derbasbûyî de nekarîbin beşdarî qada siyasê bibin û pêşbikevin. Ew ji hêza jinê ditirsin. Nehîştine ku jin di qadên cihê yên têkoşînê de cih bigirin û serkeftî bin. Lewma di pêvajoya nû de jî rêjeya beşdarbûna jinan a qada siyasê daketiye. Ev yek jî dide diyar kirin ku civak û di heman demê de hişmendiya zilam a ku baweriya xwe bi hebûna jinê a di qada siyasê de naîne, hîn zêdetir xwe bide axaftin.

Di pêvajoya derbasbûyî de ev yek pîrr eşkere derket holê û heta di dem û civînên pîrr girîng de, dîsan di dema biryar girtinê de jî nahêlin ku jin amade bin, ger li wêderê bin jî nekarîne ku bibin xwedî nêrîn û bi rengê jinê beşdarbûna xwe bidin çêkirin. Bê guman ev jî rastiya ku ka bandora hişmendiya zilam a li ser siyasê çîqa pêş e, dide diyar kirin. Mixabin ku di dema hilbijartinan de gelek alî û partî, ji bo ku hîn zêdetir dengê jinan bidest bixin, jin bikar anîn. Nêzikatiyên der exlaqî hatin raber kirin.

**Naxwazin jin bibe hêz**

Yek ji mijara din ku herê zêde bala mirov diqşand û ber bi çav bû, ew bû ku hemû partî bi rêbazên cûda endamtiya jinan a di hilbijartinan de bikaranîbûn. Nedixwestin ku jin bi vîna xwe beşdar bibe, bibe xwedî têkoşîn. Asta têgihîştin, têkoşîn û beşdarbûneke li ser bingehê feraseta rast zêdetir, wechên ku zilam dixwest di hilbijartinê de



bibirin û pêş li nerazîbûnan bigirin. Gel bi kuştin, ziman jêkirinê ditirsandin. Bê guman bikaranîna zimanek bi vî rengî, bi taybetî ji bo jinê tu feydeya xwe nîne, ji bo civak û gel jî feydeya xwe wê nebe. Ger di hilbijartinê de serkeftin hebe jî nikare serkeftina jinê misoger bike û bibe çareseriya pirsgerêka jinê. Mixabin ku piraniya namzedên PDK'ê zimanek wiha tûj li hember gel bikaranîn: Ger bi hîle û tirsê serkeftinê jî lê nêzikatî û hişmendiya vê partiye ji aliyê gel de baş hatiye fêhm kirin û têgihîştin.

derdiketin pêş. Di pêvajoya hilbijartinê de dixwestin jinê wek meta bikar bin. Nedixwestin ku di hilbijartinê de jin wek hêz xwe birêxistin bike, yan jî bi hêza xwe derkeve pêş.

Di hilbijartinê de piranî kesên di nav civakê de tên nasîn, mînak keç û hevjinên şehîd, şêx û kesên ji gire giranin, dihatin destnîşan kirin. Ev yek jî dide diyar kirin ku ji bo wan hebûna jinê a di nav siyasê de tenê bi awayek ne fermî û pîrr jî ne girîng bû. Ji xwe ger jinên ku bixwazin xwedî nêrîn û vîna azad bin jî ji aliyê wan de ji nedîtî tîn, guhdarê wan nakin û bi tenê dimînin. Bi kurtasî jî bo jinan li başûrê Kurdistanê di qada siyasê de cih girtin ne ewçend jî asan e. Tevahî mijarên heyî dibin sedem ku gel û jin zêde baweriya xwe bi hilbijartinan neyînin û piraniya gel ji xwe beşdarbûna xwe a hilbijartinan neda çêkirin. Me şaş negot, bi hîle û dizîna dengê gel û dîsan beşdar kirina kesên cihê, carekedin dengê xwe zêde kirin.

**Mirov nikare behsa serkeftinê bike**

Di hilbijartinan de gelek endamên PDK'ê bi gef û tirsê hewldan dengê gel yê dijber

# Keskesor

Keskesor bû  
Baran bû  
Ewr bû  
Tav bû  
Çi bihar  
Pepûkê di neqeba bê û guhê me de  
Dadigirt dengê poşmaniya xwe  
û mohr dikir keleng li bihara mey rengîn  
Ez pey hizna te a nazik  
Pey xwîna te a şêrîn bûm  
Delalê xwehka xwe bûyî tu  
û xezalek kedî nedibûyî  
Ji evîna te sermest û kovan bû bihara dawî  
Di xweşiya biharê de  
Di nava ferca tew delaliya wa kêliyan de  
Jiyan bohîstek bextewariya serwext bû  
Me hîqe hîqa kenê xwe dişand  
Nav şahiya xurmêniya berq û birûskan  
û keskesorên renga reng  
Çi wext  
Çi dinya  
Jiyan  
Çilo wilo diherikî  
Lawikên herî ji dil digotin ku guhê şênî û zindiyên vî welatî  
Xezaliya te ahenga çiyayê berxwedêr  
Ji deverên kimtedûr re digotin delalê  
Ew çî zeman bû ku min  
Serbestiya heskirina te a şîrîn distirand  
Baran dihat xwehkê  
Berq û beledyan vedidan komik  
Şiyar dibûn

*Dema nobedariya te bû  
Ez û tu bihev re diçûn nehortiya danê wê beresrê  
Gelekî şad bû keli  
Qet dilê me jî bîra nedikir ew gava ku hêdî hêdî  
Hêdî hêdî xwîşîrînê dihat  
Me ji hev re sond xwar  
Li ber bayê hênîk ê demsala rengîn a biharê  
Ji bo vegereke din û careke di  
Hemû tişt ji bo xatirê xwîşîrîniya te bû xezalê  
Meşeke şevê,  
Meşa me a gerilla  
Ya min û te yeke  
Meşa şevê  
Ya min û te a dawî  
Û heyv zirav  
Tuyê bêjî heyva çardehan  
Stêrk li dorê diçirsin  
Te digot, 'bi kelecanim'  
Bayê baranê xwe dijdand  
Li dev û rûyê me diqelibî ji qafil da  
Ez bi kelegirî dibûm  
Te digot, 'ez qet natirsin û ger wînda bibim jî tu cem minî'  
Ez gelek ditirsiyam xwehkê  
Ne ji windabûnê ha  
Ez gelek ditirsiyam  
Û bi firînekê bê per li bayê te siwar dibûm  
Keli, keli bû hetta tu bêjî  
Di cokekê de av giha bû hev  
Te xwe tewand û menterê xwe yê avê dagirt  
Qurtek av bû bextewariya meşa me a wê şeva hênîk  
an jî tişteke din bû  
Çibû nizanîm  
Dengê kenê te û baranê bi hev re rihê min dişûştin xwehkê  
Westanê xwe li deriyê şeveke kin û dirêj dixist  
Ne xelas dibû  
Ne jî dem têra me dikir  
Dîsa û dîsa  
Nivco dima her tişt  
Nivco dima careke din her tişt xwehkê*

Sîya BAGOK



Ji bo bîranîna rêheval Robîn MîDYAT (Bêrîvan AKAN) ku di sala 2017'an de, li Mardînê şehîd ket.